

# Jîn

Jimara çarê

Heyva Tebaxê 2006

Vercinye, Emrîke

perê - 1

Hindek cara ez pisîar dikim milletê Rojhelata Navîn ji kîve hatîne. Belkî hindek ji wana ji binemala pêxember Îbrahîmî. Jina wî ya ewilî Sare Xwidê Îşîaq daê, u Îşîaq babkalkê Cihîa u Edûmîa ye. Jina wî ya dûê Hacer Xwidê Îsma'îl daê u ew jî babkalkê 'Ereba ye. Piştî Sare mir, Îbrahîmî jinek dî îna, navê wê Qetûre bî u Xwidê şeş kurr danê. U navê wan Zîmran u Yeşsan u Midan u Mîdîan u Yeşbaq u Şuhîa. Belkî ji van kurra babkalkê Kurda u Farisa u Afxanîa u Kaldana u Sirîana u milletê dî li Rojhelata Navîn.

Ji ber hindê, heker hemî milletê Rojhelata Navîn bira u pismamê êk u dû ne, u heker ew hemî ji êk mal hatîne, buçî kerrbê wan gelek ji êk u dû çit? Buçî bu hizaran sala êk u dû dikujin?

Demekê di mêjua Kurda da bu nimûne salê 90 Kurda şerrî êk u dû kir u gelek kes hatina kuştin. Buçî? Kurd êk millet in u hemî birayê êk u dû ne. Pêtivî ye hemî heş êk u dû bikin u rêzê li êk u dû bigirin. Her wesa digel kesê bîanî da, çunku heker her miruvek heş Xwidê bikit, dê rêzê li xu girit, her wesa dê heş heval u cîran u kes u karê xu kit.

Reha kerrb u kînê u kuştinê serhildan beramber Xwidê ye.

## Ma ez piştevanê birayê xu me?

Wextê Adem pêxember li Beheştê 'Eden bî, Xwidê ferman li wî kir, "Ji hemî darê li behêstê bixu, belê hişîar be ji dara zanîna baş u xirabî ne xu çunku heker te xwar bê guman tu dê mirî." Belê piştî hîngê her dû Ademî u jina wî fêqîê ji dara zanîna baş u xirabî xwar, leşê wan dest pê kirin piç piç mirin u gîanê wan jî mirin – ji ber gunnehê wan hevalbendîa wan digel Xwidê hate birrinê. Belê Xwidê li wan burand, bes ji ber gunnehê wan Xwidê gîanewerek bê gunneh kuşt u cilik ji çerimî bu Ademî u Hewaê çêkirin u kirine ber wan. Îna ji ber gunnehê wan, Xwidê ji beheştê 'Edenê derêxistin daku ew fêqîê dara jîanê ne xwin u bijîn her u her bi leşê mirî.

Adem u Hewa dû kurr hebîn, navê wan Qabîl u Habîl bîn. Kerrbê Qabîlî ji birayê wî vedibî. Ku Qabîl kesê êkê bî li ser 'erdî êkê bikujit u birayê xu Habîl kuşt ji ber serhildanê wî beramberî Xwidê. Eve he çîroka wî ye.

Qabîl cutîar bî u Habîl şivanê pezî bî. Zanîn pêtivî ye


qurbanekê bu Xwidê bidin. Qabîlî berhemek ji berhemê 'erdî pêşkêşî Xwidê kir, belê Habîlî ji baştirîn u qelewtirîn nexirîet pezê xu pêşkêşî Xwidê kir. U Xwidê gurîê Habîlî qebîl kir u jê razî bî, belê gurîê Qabîlî qebîl ne kir u jê razî ne bî (çunku bê xwîn bî).

Îna Qabîl gelek kîn girtî bî u navçavê wî têk çûn u gelek turre bî.

Xwidê pisîar ji Qabîlî kir, "Tu buçî kîn girtî bî ji ber Habîlî? Buçî navçavê te têk çûn? Heker te kirîara baş kir ba, erê navçavê te ji keyfa geş ne dibî? U heker tu kirîarê baş ne kî, gunnehek ya li def dergehî li hîvîa te ye, u di dana di çirrsînî u gelek divê desthelatî li ser te bikit. Belê divê tu desthelatî li ser bikî."

Qabîl guhê xu peyvê Xwidê ne bî u piştî hîngê hêş kire birayê xu Habîlî u kuşt.

U Xudanî pisîar ji Qabîlî kir, "Kanê birayê te Habîl?"



Ewî bersiv da, "Ez nizanim. Ma ez piştevanê birayê xu me?"

Îna Xwidê gutê, "Te çî kirî ye? Dengê xwîna birayê te ji 'erdî hewar dîkit min." U Xwidê nîfrîn li Qabîlê kir u wesa Qabîl ji def Xwidê derket.

\*\*\*\*

"We yê guh lê bî, ku ya gutî ye xelkî berê: kuştinê ne kin u her kesê kuştinê bikit pêdivî sizakirnê ye. Belê ez dibêjime we, her kesê ji birayê xu turre bit, pêdivî sizakirnê ye u her kesê bêjite birayê xu "Ey Nezan" yê pêdivî ye li ber civata bilind bête dadgehkirin u her kesê bêjît "Ey êvel î!" pêdivî agirê duxexê ye.

Vêca heke te li gurîgehê [cihê qurbanê] xelatê xu pêşkêşkir u li wêrê hate bîra te, ku birayê te tiştêkê li ser te heye, xelatê xu li ber gurîgehê bihêle u here birayê xu aşî bike u paşî were xelatê xu pêşkêş bike.

Lezê bike hêştî hîn di rêka dadgehê da digel hevdişê xu pêk were, heke ne dê ew te dite destê dadwerî, dadwer jî dê te dite destê zêrevanî u dê te havêne di zîndanê da. Bi rastî ez dibêjime te, ku tu ji wêrê dernakevî heta tu fîlsê dîmahîê jî ne dî."

- axiftina 'Îsayê Mesîh' (Mizgînî ya Mettî 5:21-26)